Hallo
Basel-Stadt

Kanton Basel-Stadt

# Kar / xebat

Têketina bazara kar
Dîtina kar
Maf û berpirsyarî
Bêkarî
Fermîkirina dîplomeyê

# Têketina bazara kar

Li Swîsreyê karkirin an vekirina şîrketekê girêdayî hemwelatîbûna we û sedema hatina Swîsreyê ye. Kesên kar dikin di her rewşê de, divê qeyda xwe ya sîgorteya civakî çêkin û bacê bidin.

## Destûrnameya kar

Pirsa destûrnameya kar bi piranî di heman demê de bi dayîna destûrnameya mayînê ya li vir re tê zelalkirin. Di rewşên asayî de, mirov dikarin bi mafê mayîna li vir jî li Swîsreyê kar bikin. Li gor hemwelatîbûnê û dirêjiya kar, karsaz an karker daxwaza destûra kar dike. Di rewşên nezelal de yek ji ciyên li jêr hatine diyarkirin, dikare alîkariyê bide. Ev cî şêwirmendiya kesên hîn nehatine Swîsreyê, lê dixwazin li vir bixebitin jî dikin. Pêdiviya penaberên mafê mayînê stendine (nasnameya B) û kesên bi demborî hatine qebûlkirin ên bi statuya penaberiyê, yan bê statuya penaberiyê (nasnameya F) bi stendina destûra kar a taybetî tine ye. Lê belê destpêkirin û bidawîkirina her bicîbûna li karekî, divê bi formeke fermî li kantonê were qeydkirin (pêvajoya qeydkirinê, Meldeverfahren). Kantona mirov lê kar dike berpirsyar e. Ev qeydkirin belaş e. Pêdiviya kesên daxwaza penaberiyê kirine (nasnameya N) bi destûrnameya kar heye.

## Fîrmaya we/şîrketa we

Li Swîsreyê bê kesek dikare şîrketekê ava bike yan na, girêdayî hemwelatîbûn û statuya mayîna li vê derê ye. Ji bo mirovên ji welatên YE/EFTAyê û mirovên xwediyê destûra mayîna bêdawî ya C sazkirina şîrketekê hêsantir e. Saziya koçberiyê (Migrationsamt) koçberan li ser vê yekê agahdar dike, bê sazkirina şîrketekê mumkun e. Bipêşdebirina cîûwaran a kantonê (Standortförderung) piştgiriya karûbarên pratîkî dike.

## Karê bi reşî / karê nehatiye beyankirin

Kî kar bike û li ba sîgorteya civakî neqeydkirî be, destûra kar tine be yan jî hatineya xwe li ba saziya bacê diyar nekiribe, xwe dixe rewşa cezakirinê. Wê demê mirov qala karê bi reşî (Schwarzarbeit) dike. Encamên hiqûqî yên karê bi reşî ji bo kesên kar didin û kar dikin heye. Ji bilî vê, kesên (bi reşî) kar dikin li hember qezeyan nehatine sîgortekirin û amadekariya wan a xanenişîniyê (teqawîdbûnê) tine ye. Kî bawer dike, ku karsaz wê, wî bi awayekî rast naxebitîne, divê serî li ciyekî Şêwirmendiya Hiqûqî (Rechtsberatungsstelle) yê belaş bide.

## Ciwan

Bi bingehî ciwan dikarin destpêkê piştî 15 saliya xwe dest bi kar bikin. Lê ji karên sivik ên bi rêjeyek biçûk (wek mînak karê bînvedanê) re destûr heye. Divê kesên kar didin û dêûbav baldar bin, ku barê ciwanan ne giran be. Ji bo ciwanên heta 18 salî hikmên zagonî yên taybet ên kar derbasdar in.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/arbeit/zugang-arbeitsmarkt

# Dîtina kar

Gava mirov bi welatên din re bide ber hev li Swîsreyê tenê hinek bêkar hene. Lêbelê hewcedariyên kesên li kar digerin zêde ne. Bawername û dîplome xwediyê wateyeke mezin in. Zanîna almanî hema hema ji bo her ciyî pêdiviyeke girîng e.

## Şarezayî

Li Swîsreyê bidawîanîna pîşeyî, dîplome û perwerdeyên wirdetir hema hema ji bo hemû pîşeyan pir girîng in. Dîplomeyên welatên din herdem nayên naskirin. Gava mirov li kar digere referansa karsazên berê jî pir girîng e. Ji bo gelek ciyên kar zanîna almanî dixwaze.

## Dîtina ciyê karkirinê

Mirov dikare derfetên ciyên karkirinê di rojnameyan de û li ser malperên cihêreng ên înternetê bibîne. Li kêleka wê, buroyên taybetî yên navbeynkariya ciyên karkirinê hene. Navendên navbeynkariya kar ên herêmî (RAV) yên fermî dikarin di lêgerîna ciyê kar de alîkariya we bikin. Li wê derê kompûter û rojname hene û xebatkar şêwirmendiya kesên li ciyên kar digerin, dikin.

## Serlêdana kar/karname

Ji bo ciyekî kar, mirov bi gelemperî bi nivîskî bi riya e-mailê yan li ser internetê serlêdanê dike. Ji bo serlêdanekê herî kêm, divê kurtejiyan, nameya motîvasyonê û ger derfet hebe bawernameyên xwendinê, dîplome û bawernameyên karkirinê werin pêvekirin. Gava serlêdana we bala kesên kar didin bikişîne, ewê we vexwînin axavtineke xwedanasîna kesane. Gelek ciyên cuda ji bo amadekirina serlêdana kar alîkariya belaş didin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/arbeit/arbeit-finden

# Maf û berpirsyarî

Kesên kar dikin û kesên kar didin xwediyê maf û berpirsyariyên cuda ne. Bi zagonê, wek mînak, dema herî zêde ya karkirinê, mafê bînvedanê û parastina sîgorteyî hatine diyarkirin.

## Peymana kar

Di rewşên asayî de, peymana kar bi nivîskî tê çêkirin. Lê belê peymanên devkî jî derbasbar in. Hikmên zagonî yên zagona peywiran (Obligationenrecht) derbas dibin. Standartên herî kêm tê de hene. Di encamê de kesên peymana wan a nivîskî tine ne jî, xwediyê mafên cihêreng û berpirsyariyan in.

## Mafên karkeran

Li Swîsreyê mafên zagonî yên cihêreng ên karkeran hene. Ji van yên girîng ev in:

- Karsaz ji qeydkirina li ba sîgorteya civakî ya karkerên xwe berpirsyar in, divê ew sîgorteya qezayê jî çêkin û beşek ji tibaba were xwestin bi xwe bidin.
- Mafê hemû karkeran ê herî kêm 4 hefteyan bînvedana heqê wê hatiye dayîn bikin, heye.

Ev yek ji bo kesên bi heqdestê serê saetê yan demeke rojê kar dikin jî li gorî karê dike, derbasdar e.

- Destûra dema karkirinê ya herî zêde di hefteyê de 50 saet e. Di hinek beşên kar de hefteyê tenê 45 saet e.
- Mafê kesên kar dikin ê bawernameyeke karkirinê ya nivîskî bistînin heye.
- Kî nexweş bikeve yan qezeyekê bike û li ba şîrketekê ji sê mehan zêdetir xebitî be, mafê xwe yê ji bo demeke diyar berdewamiya stendina mehaneya xwe heye.
- Jinên ducanî û jinên zarokek anîbin ser ruyê erdê, xwediyê mafên taybetî ne (parastina dayikê, Mutterschutz).
- Zagona derfetên wekheviyê (Gleichstellungsgesetz) li ser kar cudakirina kesekê/kesekî ya ji ber zayenda wê/wî qedexe dike.

## Mehane/meaş/mûçe

Li Basel-Stadtê zagona mehaneya herî kêm heye. Ev yek bi hinek îstîsnayan ji bo hemû karsazên kantonê derbasdar e. Wekî din li gelek beşan peymaneke kar a tevayî (Gesamtarbeitsvertrag GAV) ya tê de mehaneya herî kêm hatiye diyarkirin, heye. Mafê jinan û mêran ê stendina heman mehaneyê ji bo heman karê dikin, heye. Tibaba di peymana kar de hatiye diyarkirin, mehaneya ne safî ye. Mehaneya safî piştî jêderxistina tibaba sîgorteya civakî wê were dayîn (jêkêmkirina civakî, Sozialabzüge). Ji bo piraniya kesên xwedîdestûrnameya B, nasnameya F an jî N, destûra mayîna kin L, an yên destûra derbaskirina sînor G wê yekser ji baca hatineyê (Quellensteuer) werin qutkirin. Tibaba sîgorteya nexweşiyê ya mecbûrî ne parçeyekî jêkêmkirina mehaneyê ye.

## Betalkirina kar

Di rewşeke betalkirina kar de, divê karsaz û karker li gor dema jikarderxistinê ya di peymanê de hatiye diyarkirin, tevbigerin. Jikarderxistinên demkin/bêagahdarkirina ji berê ve, tenê dikare di rewşên îstîsnayî de pêk were. Mirov her dem dikare ji bo betalkirina kar sedemnameyeke nivîskî bixwaze. Kesên nexweş, yên qeze derbas kiribin, yên ducanî yan zarok anîbin, bi taybetî li hember betalkirina kar parastî ne. Ji bo betalkirinên kar ên ne di cî de yan niyetxerab dikare li dadgehê were îtîrazkirin. Ger karker bi xwe kar betal bike, ew dikare bandorê li ser tibaba piştgiriya ji sîgorteya bêkariyê bistîne, bike.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/arbeit/rechte-und-pflichten

# Bêkarî

Hemû kesên di karekî de bi cî bûne li hember bêkariyê ewlekirî ne. Kî betal bimîne, bi gelemperî ji bo demeke diyar alîkariya diravî distîne. Kesên bê kar mane, divê serî li Navenda Navbeynkariya Kar (RAV) bidin. Ev der di dîtina ciyê kar de alîkariyê dide.

## Sîgorteya bêkariyê

Sîgorteya bêkariyê (ALV) saziyeke dewletê ye û ji bo hemû kesên di karekî de bi cî bûne mecbûrî ye. Tibaba her meh were dayîn rasterast ji mehaneyê, mûçeyê tê qutkirin û karsaz nîvê wê digire ser xwe. Kesên serbixwe kar dikin, nikarin xwe li ba sîgorteya bêkariyê bidin sîgortekirin. Kî bê kar bimîne, ji qaseya bêkariyê mehaneyeke alîkariyê distîne (Pereyê bêkariyê). Bê kengî û çiqas zêde pereyê bêkariyê (Arbeitslosengeld) were dayîn, girêdayî faktorên cihêreng e. Wek mînak, mirov demeke çi qasî dirêj xebitiye yan ji ber çi sedemê bêkar maye.

## Pêvajoya rewşa bêkariyê

A baş berî roja dawî ya kar, herî dereng roja destpêkê ya bêkarmayînê, divê mirov bi lez serî li Navenda Navbeynkariya Kar a Herêmî (Regionales Arbeitsvermittlungszentrum, RAV) bide. Li wê derê wê hemû gavên pêwîst werin ravekirin.

## Navenda Navbeynkariya Kar a Herêmî

Navenda Navbeynkariya Kar a Herêmî (RAV) alîkariya we dike, ku hûn bi lez dîsa ciyekî kar bibînin. Gava mirov pereyê bêkariyê distîne, tevlêbûna axavtinên şêwirmendiyê yên li ba RAVê pêwîst e. Lê RAV kurs an bernameyên mijûlbûnê jî pêşkêş dike. Herwiha tevlêbûna beşeke ji van jî pêwîst e. Kesên hîn li Swîsreyê qet nexebitîne û li karekî digerin jî dikarin xwe li ba RAVê bidin qeydkirin. Lê ew pere nastînin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/arbeit/arbeitslosigkeit

# Fermîkirina dîplomeyê

Dîplome û bawernameyên ji welatên biyanî li Swîsreyê herdem ne derbasdar in. Fermîkirina dîplomeyê di bin hin mercan de pêkan e. Ev yek ji bo hin pîşeyan pêwîst e.

## Fermîkirin

Kesên xwediyê dîplomeyeke ji welatên biyanî dikarin wê di bin hin şertan de li swîsreyê bidin fermîkirin. Bi fermîkirinê, wê were erêkirin, ku dîplomeyeke ji welatê biyanî yan jî bawernameyeke ji welatê biyanî bi dîplome yan bawernameyeke Swîsreyê re di heman nirxî de ye. Ji bo hin pîşeyên birêkûpêkiyê dixwazin (wek mînak pîşeyê hemşîretiyê, mamosteyî û hwv.) ji bo karibin pîşeyê xwe bikin, pêdivî bi fermêkirinê heye. Ji bo fermîkirinê li gor her pîşeyî yan her bawernameyê ciyên cuda berpirsyar in. Buhayekî fermîkirinê heye. Ciyê Têkiliya Neteweyî ya Nasîna Dîplomeyê (Nationale Kontaktstelle für Diplomanerkennung) an jî Şêwirmendiya Pîşe, Xwendin û Kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) agahiyan par ve dikin.

## Erêkirina astê

Di warê pîşeyên ne girêdayî birêkûpêkiyê de, ji bo li Swîsreyê kar bikin, pêdivî bi fermîkirina dîplome yan bawernameyan tine ye. Ji bo van pîşeyan dikare erêkirina astê (Niveaubestätigung) were xwestin. Ev jî nirxê ciyê dîplomeya biyanî ya di nav sazûmana perwerdeyiya Swîsreyê de nîşan dike. Erêkirin dikare di dema lêgerîna ciyê kar de alîkariyê bide. Ciyê Têkiliyên Netewî ya ji bo Naskirina Dîplomeyan an jî Şêwirmendiya Pîşe, Xwendin û Kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) agahiyên ji bo erêkirina astê par ve dikin.

## Dubarekirina xwendina pîşeyî

Kesên mezin ên xwedîtecrubeya pîşeyî lê bê dîplomayek an bawernameyeke hatiye fermîkirin, dikarin li Swîsreyê xwendinekeperwerdeya bingehîn a pîşeyî_yan jî perwerdeya pîşeyî ya bilind_cardin bistînin. Pêvajo girêdayî xwendina berê hatiye kirin, tecrubeya pîşeyî û temen e. Di her rewşê de asteke baş a zanîna almanî şertekî bingehîn e (Asta B1/B2 li gorî GER). Kesên bixwazin dikarin li ba Şêwirmendiya Pîşe, Xwendin û Kariyerê (Berufs-, Studien- und Laufbahnberatung) bê pere agahî û şêwirmendiyê bistînin. Kî perwerdeyeke pîşeyî cardin bidest bixe, şansê xwe yê di bazara kar û têketina perwerdeyên piştretir de çêtir dike.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/arbeit/diplomanerkennung